



Yariya basketbolê

Yariya basketbolê piştî yariya futbolê bi duwemîn yariya netewî li cîhanê dihête hejmartin.

Ev yari ye li Emerîka peyda bûye û li sala 1891 ê yasa û rêsayên wê ji layê (di Cîmis simît) ve hatine danan.

Li sala 1893 ê, yekemîn qaremaniya basketbolê li ser astê zankoyan li Îtaliya hate gêran.

Li sala 1936 ê bo cara yekê çû di nav xula yariyên olompî da li Berlinê.

Pênasa vê yariyê ew e, her yariyerek bişê bi sanahîtirîn şêwe tepê pavête di selka fîma beramber de. Ev yari ye bi du fîma dihêlîzin. Her fîmek jî pênc yarikeran pêk dihê.

Demê her yariyekê 40 deqîqeye ku dabeş dibe ser çar çaryekan û her çaryek 10 deqîqe ye.

Ji mercên serekî yê wê yariyê ew e tu tepê bi destî davêji di selka fîma beramber de û ev gole hindêk cara bi du xalane û hindêk cara bi sê xalan e û hindêk caran bi xalêkê. Dirêjahiya yarigehê basketbolê bi pîvanên navneteweyî 28 mêtir e û firehiya wê 15 mêtir e.



Her yariyerekê pênc fawla bike dê ji yariyê bihê derêxistin û hevaleyê dî dê cihê wî bigire.

Divê yariyê de çênabe yariker tepê bigire û bi rêve biçê. Her fîmeka dest bi hêrişê dike diviya di maweyê heşt çirkeyan de bigehe, qada fîma hevirk û di maweyê 24 çirkeyan jî da tepê biavêje selka fîma dî.



Du dadivan wê yariyê bi rê ve dibin di gel demgirê yariyê û tomarêrî û demgirê 24 çirkeyan. Yari bi bilindkirina tepê di navbera du yarikeran de li nîva yarigehê dest pê dike û bi firika demgirê yariyê bi dûmahî dihê.

Ji hejî gotinê ye ku tepa basketbolê jî tepa futbolê û voleybolê bisengtir e.





Yaneya senharîb

Yaneya senharîb wek yaneya kiçan li parêzgeha Duhokê dihê niyasîn. Ev yane ye li sala 1992 ê hatiye damezrandin û heta niha ya berdewam e di pişikdarîkirinê de di lehengên Iraq û Herêma Kurdistanê de.

Li vê yaneyê yariyên: Futbol, baskêt, voleybol, tewa destî, yariyên gorepanê, tewa mêzê û setrenc li ser astê kurran û baskêt, voleybol, tewa desîfî, tenisa erdî, tewa mêzê, yariyên gorepanê û paysgîl li ser astê keçan dihêne kirin.

Ji baştirîn encamên vê yaneyê:

*Nasnavê cama Iraqê ya basketbolê li ser astê lawan li sala 2000 ê.

*Tima keçan li rêza yekê di lehengiya basketbolê d li ser astê Iraqê li sala 2000 ê derdikeva.

*Tima keçan li rêza duwê ji lehengiya Iraqê ya voleybolê li sala (2006) ê derikefit.

Ji yarikerên navdarên vê yaneyê:

Her du bira Êwan û Reyvan Dawid helbijartiyên tîma Iraqê ya basketbolê.

Ji keçan: Îvan Dawid, Murîn Dawid, Karulîn Elbêrt, Marlîn Firensîs, Colêt Gurgîs ku her hemû di helbijartiyê Iraqê yê yariyên basketbolê û voleybolê de yariyê dikin li ser astê parêzgeha Duhokê ji eve çendîn sale lehengiya basketbolê û voleybolê û tewa destî ya keçan bi dest xwe ve dinin.



Li Dîdara Kepirê

Receb Xelîl

Receb xelîl yek ji yarikerên çelengên tîma taze pêgehiştîyên yana Duhokê ya futbolê ye.

Temenê wê 15 sal in û xwendekar e li pola duwê navincî.

Receb dibêje: "Ez hez dikim di paşerojeka nêzik de bigehime astê yarikerên mezin û bi taybetî helbijartiyê Iraqê (Casim mihmed Hacî)."

Li ser astê xwandinê hez dike di paşerojê de bibe mamostayê werzişê.

Receb ev e sê sal e yariyê dike û di van sê salan de wek yarikerê çeleng hatiye nas kirin.

Receb malavayî rahênerê xwe (Zekî Ubeyid)î dike ji bo handan û piştewaniya wî ya berdewam.

Şîreta wî bo hevalên wî ew e, ku wextê xwe bi şeweyekê dirust li ser erk û arezûyên xwe belav bikin.

Li dûmahiyê daxwaza serkeftinê bo hemû endamên tîma xwe dike û bi taybetî Warihêl, Hisên, Merwan. Her wesa malavayîya kovara kepirê dike ji bo vê dîdarê û dibêje:

"Hêviya min ew e, kepir her wesa ciwan derbîkeve".

